rupel 1.qxp_Layout 1 31.12.2021 17:41 Page 1



## Sakîne, Leyla û Fîdan

Gelek caran em ji bîr dikin ji xwe pirs bikin! Gelo ez kî me, ji kê derê hatime, li ku me û çi me? Berî her tiştî ji bona em bikaribin bibin xwediyê wateya jiyan, armanc û xeyalên ku em dijîn û bersiva van pirsan rast... ***Kurdistan Lezgiyeva / R.6***



## Salên kulê

Gotineke Voltaire heye, dibêje, "Min biryar daye ku êdî ez ê bextewar bibim, ev ji bo tenduristiya min baştir e." Gotineke erênî û xweş e. Mirov xweziya xwe tîne ku her kes karibe sibehekê ji xew şiyar bibe û ji bo jiyana xwe bi vî... ***Yaqob Tilermenî / R.5***



## Jinên Efrînê di azadiyê de bi israr in

Jinên Efrînê di tevahiya salê de, li kêleka têkoşîna jinên azadîxwaz û têkoşer; li dijî çavsorî û dizekên çeteyên dewleta tirk, di nava berxwedan û çalakiyan de bûn. Tevî berxwedana xwe ya bêhempa ya îsal, rêxistinkirina pergala xwe ya... ***Leyla Lorîn / R.2***

# xwebûn

3-9 ÇILE 2022 HEJMAR: 107 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org

# Bila ev sal bi dilê gelan be

Gelên li Rojhilata Navîn bi pêşengtiya kurdan sala 2021'ê kir sala berxwedanê. Ji destpêka salê heta dawiya salê bi çalakiyên cihêreng li dijî polîtîkayên şer, tecrîd, qeyrana aborî çêkên kîmyewî û koçberiyê daketin qadan. Ji 8'ê Adarê heta Newrozê, ji pêngava Dema Azadiyê heta berxwedana li zindanan, ji qadên parastinê heta Nobedên Edaletê li ber xwe dan.




# Şeş pêşengên şoreşa jinan



Ji zindanê heyanî ber bi çiyayên azad, kêlî bi kêlî vegotina têkoşîna Sakîne Cansiz , dîrokeke ji agir e. Sarayê, ji çiya û xwezaya Kurdistanê hez dikir; bi ahengiya xwezayê, ber bi peravê ava Zê diherikî dil û ruhê wê yê zîz û nazenîn. Di dendika çanda dîrokê de, li pey hêza jinan a xwedawendî ketibû. Li şopa şaristaniya şoreşa jinan dipirsî... Pergala desthilatdar heyîna xwe li ser tundî, kedxwarî û derewan birêxistin kiriye. Bi kolekirina 'neteweya' jinan re pênc hazar sal in mîna dêwê heftserî ji nirxên jinan dixwe. Li dijî jinan di nava şerê qirkirinê de ye. Her cara ku binkeftinê dijî, li jinan dixe û êrîşî pergala jinan dike. Bi komkujiyan bersiv dide jinên xwedî rêxistin ên têkoşer. Komkujî, navê lanetê ya wî zilamê zikreş ê fesad e. Mêrê hesûd/desthilat her ku winda dike, lewaz dibe, bi êrîşan dixwaze ji jinan tolê rake. Ji lewra hêzbûna jinan, lewazbûna pergala serweriya mêrên hesûd in. Sara, Rojbîn û Ronahî di 9'ê çileya ... ***Adar Gulan / R.2***

## Peymana 9'ê cotmehê li Mexmûrê ferz dikin

Êrîş û zextên li ser wargeha penaberan a Mexmûrê pêş dikevin bi îmzekirna peymana 9'ê cotmehê ve girêdayî ne. Rêvebiriya Bexdayê di çarçoveya vê peymana bêyom de hewl dide li Mexmûr û Şengalê dest deyne ser îradeya gel. Ji bakurê Kurdîtanê di sala 1993-94'an de bi hezaran kes ji ber zilm û zordariya dewleta tirk ji neçarî koçî başûrê Kurdistanê kirin. Ev kes bi rêzê li wargehên Bihêrê, Şeraniş, Bêrsîvê, Geliyê Qiyametê, Etrûş, Nînova û Nehdaran man. Koçberên ji bakûrê Kurdistanê piştî rêwitiyeke zor û zahmet sala 1998'an li quntara çiyayê Qereçoxê yê li navçeya Mexmûrê bi... ***Felemez Ulug / R.6***

## Vî bajarî çong nedanî

Cizîra Botan xwedî dîrokeke kevin, têr û tijî ye. Berxwedan û serhildanên vî bajarî şahidiya vê dîroka qedîm kirine. Heta jê hatiye serî li ber desthilatan nedaniye. Bi helwesta xwe ya rast bûye mijara gelek stran û destanan. Lewma dema meriv bixwaze behsa Cizira Botan bike, beriya her tiştî divê mirov bisekine, bihizire û piştre gotinên xwe di moxilka hiş re derbas bike, dûvre biaxive. Lewra ev 6 sal in ku di ser êrîşên hovane yên dewleta tirk re derbas bûne jî hê meriv nikare di der heqê berxwedana Cizîra Botan de binivîse. Ev nivîs jî wê nikaribe... ***Hisên Çatikkaş / R.8***

## Armanca êrîşên li ser HDP û Kobanê yek in

Tirkiye her ku di hundirê xwe de di warê siyasî û aborî de qeyranên mezin dijî êrîşan dibe ser kurdan. Li Bakur, Başûr, Şengal û Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi awayekî dijminane kesên ku êrîşan dibe ser avahiyên HDP'ê diparêze û li aliyê din jî kurdan qetil dike. Tirkiyeyê herî dawiyê di 25'ê kanûnê de bi balfirên bêmirov êrîş bir ser Ciwanên Şoreşger ên li Kobanê û 5 kesan jiyana xwe ji dest dan. Têkildarî mijarê em bi endamê Meclisa Giştî ya PYD'ê Evdilhadî Ehmed re axivîn. Ehmed diyar kir ku di encam hevkariya PDK'ê ya bi Tirkiyeyê re ev êrîşa li ser Ciwanên Şoreşger pêk... ***R.7***

## Bekoyê Ewan

Bi rastî jî Tofan tofan e, ji quntara çiyayê Cudiyê Cizîra Botan hildaye bin lêhiya xwe û riprast kiriye. Yanî Hesenê Metê xwestiye wisa bike, lê Cizîra Botan li gel kurteromana Hesenê Metê li ser piyan e. Helbet ev daxwaza jidil a Hesenê Metê piştî şanzdeh salan bi tang, top, balafir û helîkopterên tirk pêk hat; tofan li Cizîra Botan rakirin, kevir li ser kevirekî din nehîştin, bi rastî tofaneke ku bi dilê... ***Yaşar Eroglu / R.11***

## Qedrî Can û sosyalîzm



Helbestvan û nuştoxê çîrokan Qedrî Can serra 1911î de Dêrik de (Mêrdîn) ama dinya. Nameyê xo yo rast Abdulkadîr Can bî. Ey raver Dêrik de dest pê perwerde kerd û dima şî Qonya. Key ke îta de wendegehê mamosteyîye de wendêne, nasnameyê xo yê kurdî nas kerdîbî. Îta ra tepîya dest pê eleqedarbîyayîşê polîtîka bî. Qonya de perwerdeyê ey nêmcet mend. Qedrî Can serra 1928î de Tirkîya ra vejîya û şî Sûriye... ***Dr. Îsmet Konak / R.9***

## Xeybê Jinikê

Min ji îro pêde sond xwariye ku ez careke din tu kesekê/î di mala xwe de xwedî nakim, bi salan an jî bi mehan, qet xema min nîne. Hûnê bibêjin çima gelo?... Hema wilo. Ji ber êşa xeyban ez hetikîm, êş kete serê min, hişê min tevlîhev bû, hestiyên laşê min lerizîn. Çend meh berê, dostekî min, hevalekî min ji min re xeberek rêkir û got; Jinek heye li van deran, ev nêzî sê-çar sal in nas dikim... ***Kewê Redkan / R.10***

rupel 9.qxp_Layout 1 31.12.2021 15:49 Page 1



# Qedrî Can û sosyalîzm



Dr. Îsmet Konak

Helbestvan û nuştoxê çîrokan Qedrî Can serra 1911î de Dêrik de (Mêrdîn) ama dinya. Nameyê xo yo rast Abdulkadîr Can bî. Ey raver Dêrik de dest pê perwerde kerd û dima şî Qonya. Key ke îta de wendegehê mamosteyîye de wendêne, nasnameyê xo yê kurdî nas kerdîbî. Îta ra tepîya dest pê eleqedarbîyayîşê polîtîka bî. Qonya de perwerdeyê ey nêmcet mend. Qedrî Can serra 1928î de Tirkîya ra vejîya û şî Sûriye. Nê welatî de perwerdeyê xo dewam kerd û qedêna. Bajaranê Amûd, Qamişlo û Şamî de mamosteyîye kerd. Sûriye de nuştox û zonnas Mîr Celadet Bedîrxanî nas kerd. Bi destê ey kovaranê Hawar û Ronahî de helbestê û çîrokê Qedrî Canî çap bîyê.

Helbestvan Qedrî Can serra 1940an de eleqedarê fiqrê sosyalîzmî bî. Xebatê Marksî û Lenînî bala ey antîbî. Nay ra teber, helbestê Nazim Hîkmetî, Viladîmîr Mayakovskîyî, Cexerxwînî wendî û hetê îdeolojî ra xo aver berd. Diqatê xo da sosyalîzmî û enternasyonalîzmî. Serra 1957î de Moskowa de festîvalêkê ciwananê dinya yo ke 131 welatan ra da-35 hazarî ciwanan ca girowtîbî, organîze bî. Festîvalî 28ê Temuzî de dest pê kerd û heta 11ê Tebaxî dewam kerd. Qedrî Canî kî waştene sero nê festîvalî. No taw zonnas Qanadê Qurdo û cigêrayox A.Î. Orbellî ey rê hetkar bîyê. Qedrî Can bi dapancsey merdiman vejîya raye. Derdenîl, Îstenbol û Ewdîsiya (Odessa) ra şîyo û resto Moskowa. Ey raya xo ya derge de bi kirdaskî helbestêko rindek nuşto. Nameyê helbeste “Ez diçim Mosko” bî. Ma şikînîme na helbeste wina açarnime ziwanê kirmanckî:



**Ez sone Moskowa**
*Bi adirê zerrîya zahîdî yo ke*
*sono Hec…*
*Bi hewesê eşqbanî yo ke sono*
*hezkerdoxa xo,*
*Bi waştişê dergûsî yo ke xo*
*erzeno dayike,*
*Ez sone Moskowa…*
*Fekê mi, zerrîya mi gina her*
*zereyê lesê mi,*
*Her hîrê domanê mi dormeyê*
*mi de kom benê,*
*Mi ra dîyarîya Moskowa wazenê.*

*****
*Nîsto ju keştî,*
*Bi pancsey rayirhevalan,*
*Pêro mi ra bihêcaner ê,*
*Tayê arab ê,*
*Tayê çerkez, kurd û armenî yê…*
*La pêroyî de ju ziwan, ju zerrî,*
*Ziwanê embazîye û hastîye…*
*Sey birayê jubînan sonê Moskowa…*
*Kilamî, govende û veyve,*
*Kêf û şênîya înan ra,*
*Pêl û masê derya,*
*Benê minêtdar,*
*Wina û wina restîme Derdenîl,*
*Dima Istembol,*
*Dîyar û bajarê Nazim Hîkmetî,*
*Nazim Hîkmeto dergûs na*
*bêşige de*
*Sanîyo ra…*
*Dayika ey a birehme îta de,*
*Nazim Hîkmetê dergûsî rê,*
*Lorîyê azadî vatêne,*
*Vengê Nazim Hîkmetê girşî,*
*Verba îstîbdadî uca de gurrêne…*
*La bajar ewro mirozin o,*
*Lajekê xo yê fedakar û wefakarî*
*ra dûrî mendo…*
*Bineyê ninganê welatrotoxan û*
*Emerîka de,*
*Naleno…*
*Her raye û bajaranê ke ma şîyîme,*
*Heta Moskowa wina bîyî.*
*Welatê sey cenetî de*
*Sarî ti vanê milakete yê…*
*Zerrepak*
*Û Rûhuyaye yê…*
*Nêzone ke nê nazîyî senîn bom ê,*
*Çito dest radê nê merdiman…*
*Heqî ra yo ke ê peyser pijiqîyayê,*
*Mûcîze naw a…*
*Key ke dismenî dest rada*
*Nê welatî,*
*Verekê xo kî benê şêr.*

*****
*Ma restîme Ewdîsiya!*
*Mehşerê birayîye…*
*Kom-kom sar, cinîye, camêrd,*
*kokim û doman*
*Ma pîtêne,*
*Sey bêleya mîyan û verekan*
*Ma gireyayîme jubînî,*
*Virara xo kerd,*
*Ma jubînî paç kerd,*
*Îstirê kêfî û şênîye*
*Rûyê ma ra amayî war…*
*Vengê (biciwî haştîye û embazîye)*
*Vejîyêne asmên…*

*****
*Ez resto Moskowa…*
*Bi germîya zerrîya zahîdî yo ke*
*resto Hec,*
*Bi hewesê eşqbanî yo ke resto*
*virara hezkerdoxa xo,*
*Bi hêcanê dergûsî yo ke xo eşto*
*memikanê dayika xo,*
*Ez resto Moskowa…*

Helbestvan Qedrî Canî na helbeste ra teber derheqê sosyalîstan de ju helbesta bîne nuşta. Key ke o serra 1960î de zîndanê Mezeyî (Şam) de bî, uca de helbestêk bi nameyê “Roşanê Teşrîna Verênî” amade kerd. Na helbeste de şorişê bolşevîkan, şorişgêr Lenînî û Karl Marksî goyneno.

**Çime:** Qedrî Can, Hemû Berhemên Wî (Helbestê ey ê Pêroyî), Amadekarî û Pêşgotin: Rênas Jiyan, Belkî, Stenbol 2009, s. 124-127.

# Feqîrîya şarî reyde yarîya xo kenê

Çarçim

Rojanê verênan de Serekkomarê Tirkîya Recep Tayyîp Erdogan bajarê Dîlokî de patronanê tekstîlî reyde ame têhet û vat; “Ercan bey vano ke ma gêrenê karkeran la ma nêvînenê. Kesê bînî se vanê? Kar çinî yo. Nê nankorî, nankor. Ê wazenê bi ronîşte û asanî pere bidekewo cêba înan. Kesê ke kar gêrene rê nan esto, la qusur meewnenê ê ke ronîşenê rê çinî yo.” Beno ke Erdogan aye roje cayo ke şî de fikrê patronan bigîro, la gelo fikrê karkeranê tekstîlî ke çi şertanê zor û zehmetîyan de xebetîyenê û hêzo giran ê maaşê kêmî de raştê binpaykerişê her tewir tedayan yenê girewte?

**La kamê nê karkerê tekstîlî?**

Karkerê tekstîlî bi awanbîyayîşê roje dest bi mesaî kenê û tena mabenê werdî û çayî de vengê makînayan goşê înan ra vejîyeno. Karkerê tekstîlî raştê her tewir zehmetîyan yenê, endîşeyê înan ê ameyoxî esto û cuya îna ya sosyalî zî çinî yo. Gelo donemo ke ma tede vîyarenê nêweşîyêka sey janê korona ke pêroyê dinya direwta binê tesîrê xo de û cayê xebatî ê karkeran de hetê germîroşnkerdiş-hewakerdişî de nê patronî berpirsîyarîyanê xo anê ca? Eke bi asanî pere yeno qezenckerdiş se nê karkerî seba çi binê hende zehmetîyan de xebetîyenê? Sektorê tekstîlî de tewr zêde patron pere qezenc kenê, la seba çi karkerê tekstîlî endîşeyê; ez do senî nan bera keyeyê xo, ez do gureye xo ra biba, cuyenê û raştê her tewir teda û binpaykerdişê heqê merdiman yenê?

Kesê ke hewl danê algiyê ‘Tirkîya de problemê bêtalîye çinî yo’ bivirazî raporê TUÎKî yê aşma Teşrîna Verêne nêvînenê? Goreyê raporê TUÎKî tena aşma Teşrîna Verêne de 3 mîlyon û 717 kesî betal î.

Rayna Erdogan 7. Kongreyê Awarte ê Bajarî de şîbî Meletî û dîyalogê hemwelatîyêk û ê Erdoganî bale antbî. Hemwelatî vi rê vano; “Ma nêeşkenê nan berê keyeyê xo!” Erdogan zî seke yarîya xo ci reyde bikero vano; “Na çekuye mi rê zêde xişnkerde ame. Ha to rê eno çayê kêfî bişimne” û çay vir kerd. Sewbîna zî vayeya gidayî ra dima Erdogan şîbî marketê Kooeratîfê Kredî Tarimî û tay çîyan herînabî û ewja de wina vatbî; “Fîyat gayet ca de yo”. Maaşê Erdoganî qîmê ci û keyeyê ci nêkerd se ra 14 zem ard û maaşê ci bî 100 hezar TL. Karkeran ra zî wazeno ke pê 2.825,90 quruşan nan biberê keyeyê xo. Problem eno yo ke no welat de kesê ke hema zî bawerîya înan bi feqîrbîyayîşê welatîyan çinîyo esto. Raştî no yo; babîyê di domanan Adem Yarici verê walîtîya Hatayî de vat; “Domanê mi vêşan ê. Ez gure wazena.” û dima ra adir verda bedenê xo û merd. Mînakê winasîyî zêde yê.

Şima gore gelo nê merdimî seba çi ameyî merhelayêka winasî ke cuya xo, ê domananê xo û heskerdoxanê xo ra vîyarenê. Şima gore seba ke gure çinî yo, yan zî seba ke gure esto la ê nêşixulîyenê? Reyna ma vanê ê ke sarayan de cuyenê şertê cuye ê şarî ra fehm nêkenê. Goreyê dayeyanê fermî maaşê Erdoganî 100 hezar TL yo û sîmît daxî 3,5 TL yo, la şarî ra vano ke pê maaşê asgarî (4bin 253 TL ) ke ma dekewtî serra 2022î debara xo bikerêne. Donemo ke enflasyon berz bîyo û hêzê herînayîşî zî kêmî bîyo de no mumkun o? Çareserî reyna sarayî ra ame û Emîne Erdogane seba ekonomîye vat; “Porsîyonan şenik bikerêne”. Ê ke no welat de dizîya kede kenê, qezenco bêusul, ê ke bi kutuyanê ayakkabiyan pere berdî, ê ke 128 mîlyar dolarî raşte ra vînî kerdî, marîna de tewrê mafya tîcaretê madeyê tîryakî kenê, qayumê ke bi gasp ameyî şaredarîyan û şaredarîyan binê deynan de verdayî, ê ke sîyaset û dîn xebetenê bi ronişte û asanî pere qezenc kerdî. Ma nuşte bi vatişê ciwano amedij ke roportajê kuçeyî de seba kitabê ‘dinyayêka hîna adîl mumkun a’ ê Erdoganî vano ‘Merhaba’ qedênenê.



## SOHR: Serra 2021î de…



Goreyê Merkezê Muşahedeyê Heqê Merdiman ê Sûrîyê (SOHR), serra 2021î de 3 hezar û 882 kesî ameyê kiştiş, mîyan de hezar û 558 sivîl, 383 tutî û 193 cinî yê. Pêwa qanûn û pêkerdişê mîyanneteweyî, kiştiş û wêrankerdişê Sûrîye dewam keno. ***LONDON***

## Çewlîgî de mergo şikdar



Çewlîg de Wargehê Lajan ê Mursel Paşayî de goreyê îdîayan wendekar Mehmet Alî Karakuşî (21) xo kişto. Karakuşo ke Beşê Îdareyê Umûmîye de wendêne goreyê îdîayan xo pencaraya qata diyîne ra eşto war. Cenazaya Karakuşî wedarîyaye morgê Nêweşxaneyê Nêweşîyanê Cinîyan ê Çewlîgî. ***ÇEWLÎG***

## Tepişteyan rê kartî şawitî



Rêxistina HDPyî ya Dêrsimî bi wesîleya serra newîye sere de tepişteyanê nêweşan rê tepişteyanê sîyasîyan rê kartî şawitî. Kartî serrneweyî erşawîyayî zîndananê cîya-cîyayan. Kartan ser de resimê cayanê namdaran û nîşenayenê Dêrsimî yê sey pezkovî, Gelîya Munzurî û Pilemurîye estê. ***DÊRSIM***

## Kepçe dekewtî Birco Belek

Kepçe dekewtî Birco Belek yo ke tarîxê ci reseno heta 6 hezar serran û Qralîyê Gutî, Med, Asur û Mîrtîya Botanî wayîrî kerdo, qezaya Cizîrî ya Şirnexî de yo. Birco Belek û dormeyê ci hetê Mudirîya Pêroyî ya Bîyayîşê Kulturî û Muzeyan ya Wezîrîya Kultur û Turîzmî ra binê nameyê ‘peyzajî’ de xebatê restorekerdişî dîya dest pêkerdiş. Şîrketê Bazirganî, Înşaat û Turîzmî Zeydanli îhale girewt û serra 1994î de şîrketê Kartalkaya awan kerd. Şîrketê Zeydanli bajarê sey Bedlîs, Wan, Muş, Amed, Riha, Dêrsim, Amasya, Agirî, Nîgde û Şirnexî de xebatê restorekerdişî domneno. ***ŞIRNEX***